Sed û yek şew(4)



Sebah Rencder

Qelereş

Qelereşî şaw le temen netrûkên
bew bale şûm û pîranewe bo kwê mil denêy
Min wek baxewanêkî hewşî malî xuda
agadar kirawmetewe
Direxť werzî gelapêtên û donaydoniyane
Tepotozî çirnûkit be seryanewe merêje
Ba mêwe zir nebin
Balindeyekî xoşxiwan û keşnas
be ser berdêkî germ bû be xoretaw nîştewe
Çetrî be ser direxť dabeş kird
Zemîn ew kate ciwane
çetir berûy qelereş heldeyn.

Negeyiştin

Mawey hezar sal ziyatire
Be diway esp û kîselewem
Hêştaş negeyiştûmete sermêz û momêk
Ke çawî alo walay rasteqîney xewnbêt
Asodeyî sirûşt û edebî geşt bi xwînmewe

Baksî

cîhan be namom dezanê û dilopêkî netkawim
Detkême gwêy
keştî ke be tînî evîn hêzdare
Le dahatûşda debîtewe dirext
Le awî jiyan westawe
Dilim tenk bûwe û hezar sal ziyatirîşe
Le şwêpêy esp û kîsel
Dirextî bonxoş derwênim
Hêştaş amajekanim
nebûnete qiseyekî dagîrsawî
demewêwarey naw şar

Şwên
Ciwanî befîro nacê û satî direwşaneweye
Hîç şwênêk niye boy bijîm
Gorîş demî gorgêke
Kelbekanî kewtibin
Bişmirim şawanim bekraweyî demênnewe
Ey dîdarî xuda
Şitêk le nêwanman rû da
Paşan kitîb û peyamêk dozrayewe

Qeqnes
Bedirêjayî ew rêgaye sermam bû
Dilim le naw hembaneyekî xoşkirawda
per û balî sewz buwe û naumêdî dekujê
Ay lew rêga bênaxeda kes rêberîman nakat
Ew rêgayem baş nasîwe
Asmanîşî be xonaz û lûtberze
Kolarey hesretîmî ter kird
Wexte giyanim le germî tirûkanî hêlkeyek
dar û perdûy cestem çol kat
Agir birêjête rêga
Palewanî efsaneyîş le kenarî danîşin
Pepûle le nawçewaniyan peydabê
Nawçewanî germ kangay pepûleye